# MOTÎFÊN JINÊ Û YÊN DÎNÎ DI EFSANEYA ŞAHMARANÊ DE

Doç. Dr. Mesut DÜZCE
Fakulteya Îlahîyatê- Beşa Sosyolojîya Dîni- Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl/ Turkey.

Elif Gemicioğlu YAVIÇ
Nivîskar, Lêkolîner- Zanîngeha Van Yûzûncî yilê/ Turkey.

**Puxte**

Ecne Ev xebate di Efsaneya Şahmaranê de, bi taybetî jî di çarçoveya vegotinên kurdî de, di peywendîya dîrokî, civakî û çandî lêkolîn dike. Efsaneya Şahmaranê ya ku ji çanda xwedavendayan heta îslamîyeta gel û pratîkên tesawufî, li erdnîgarîyên Mezopotamya û Anadoluyê xwedî dîrokeke kevnar û domdar e. Efsane di vegotinên kurdî de ji alîyê dîrokê, erdnîgarîyê, çand, bawerîyê ve xwedî gotinên xurt e. Ev taybetmendîye jî efsaneyê ji alîyê çanda kurdî ve resen dike. Figûra jinê bi taybetmendîyên welidîn, zanyarî, fedakarî û hêzdarîyê ve temsîl dike. Bi wan temsîlîyetan ve ji alîyê rolên zayenda civakî û ezmûnên exlaqî ve çarçoveyeke rexneyî pêşkêş dike. Figûra jinê ji alîyekê ve rolên zayendî yên dîrokî û civakî lêpirsîn dike, ji alîyê din ve wekî hêzeke veguher kûrahîyekê di dîroka efsaneyê de çêdike. Figûrên dînî jî cihê efsaneyê ya ku di bawerîyên di nav gel de, cihê xwe yê pîroz û bandora xwe ya di bîra kolektîf de xurtir dike. Di baweriyên gelê kurd de şkeft û kanî wekî cihên pîroz tên dîtin. Di efsaneya Şahmaranê de jî ew cih pîroz û parçeyen pratîkên ritûelan in. Di vê xebatê de rêbazên wekî, analîzkirina gotaran, analîzên tematîk, mîtolojîk- sembolîk pêkve hatine bikaranîn. Di lêkolînên lîteratûrî de xebateke ku motîfên jinê û bawerîyê pêkve hatîne bikaranîn nehat dîtin. Armanca vê xebatê tujûkirina vê valahîyê ye. Vedîtinan da dîhar bu ku bi rêya motîfên jinê, rexneyek li ser zayendperesîya civakî pêş ketîye û bi rêya motîfên dînî jî domdarîya efsaneyê ya di baweriya gelan de temsîl dike hat dîtin. Divê xebatên pêşerojê ji bo ku efsane kûrtir bê fêmkirin nêrînên teorîk û ampirîk pêkve girêde û li ser bixebite. Xebatên teorîk û ampirîk heke pêkve bên meşandin, dê bê dîtin ku efsaneya Şahmaranê bi tenê vegotareke dîrokî nîn e. Her wiha figûreke candar ya bawerîyên gel, veguherînên civakî ye û ji bo niqaşên nasnameyîyê jî ronahîyek e.

**Peyvên Sereke:** *Efsane, Şahmaran, Vegotinên Mîtolojîk, Figûra Jinê, Motîfên Dînî.*

## Destpêk

Efsane, ji berîya dîroka nivîskî yan jî di serdemên gelek kevin de, vegotinên ku lehengên wan yan jî buyerên wan ne ji rêzê ango neasayî ne re tê gotin. Di efsaneyan de leheng, gelemperî hût, cenewar, ejderha, mar, pîrebok, elk, cin û perî ne. Hin caran jî nebat in. Wekî, dar, gul û kulîlkan. Li rex wan gîyaneweran jî her tim mirov jî hene. Efsane gelemperî (exlebe) vegotinên mîtolojîk in. Vegotinên mitolojîk ji alîyê rabirdoya mirovahîyê, ji alîyê şêwaza jîyanê, çand û bawerîyê ve çavkanîyên gelek dewlemend in. Ji bo cerabeyên ku li hemû cîhanê de mirovan pêk anî jî çavkanîyên girîng in (Tigris, 2022). Di nav wan efsaneyan de, jîyan, bawerî, nirx, çand, hest û tirsên wan civakên ku

tê de hatine gotin, cih digire. Bingeha xwe ji rastîyê girtine û bi xeyalan ve hatine vehandin. Armanca vegotina efsaneyan yên sereke; di derheqê dîrok û bingeha çandê de agahî dayîne. Di kîjan civakan de bê gotin di derheqê koka wê civakê de agahîyan radigihînin nifşên piştî xwe. Efsane bi awayekî devkî ji nifşekê radigihînin nifşeke din. Ji erdnîgarîyekê derbasî erdnîgariyeke din dibin. Piştî nivîs û teknolojî pêş ketî êdî bi awayê nivîskî û teknolojîk ve jî tên ragihandin.

Mezrabotan (Mezopotamya) û Anatolîya jî ji alîyê esfaneyan ve dewlemend in (Dalley, 2004). Gelek efsaneyên nav û deng di van erdnîgarîyan de tên vegotin. Ji van efsaneyan yên sereke yek jî Efsaneya Şahmaranê ye. Efsaneya Şahmaranê bi hezar salan e li Rojhilata Navin tê vegotin. Efsaneyeke bi piralî û sembolîzmên dewlemend ve di nava wêjeya Rojhilata Navîn de xwedî ciheke qedîm û girîng e (Yıldıran, 2001). Şahmaran hem Farisi, hem Erebi, hem Tirkî, hem Sûryanî hem jî bi Kurdî tê vegotin (Emmanuel, 1969; Demir & Şahin, 2015; Baran, 2020). Her çiqas di navbera van vegotinane de hin cudahî hebin jî di encamê de bûyera ku di efsaneyê de pêk hatî û peyamên ku radigehîne, îxaneta hatî kirin wekî yek in.

Şahmaran gîyanevereke ku hem xwedî taybetmendîyên jinê hem jî yên marî ye (Nicolaus, 2011; Deniz, 2024). Li gorî efsaneyê, Şahmaran giyaneverek e ku xwedî taybetmendîyên wekî zanyarî, hestyarî, fedakarî û rihmê ye. Di efsaneya Şahmaranê de li rex wan taybetmendî û peyamên erênî de zordarî û îxanet jî heye (Liuba, 2024). Bi wan taybetmendîyên berovajî ve tevlîhevîya efsaneyê û xwezaya wê ya ku ji bo şiroveyên cuda vekîrî dide ber çavan. Ji ber ku Efsaneya Şahmaranê pirsgirêk, xof û tirsên mirovan radixe ber çavan, ewqas li erdnîgarîyên berfireh belav e û mayînde ye. Bi wan hemû taybetmendîyên xwe yên erênî û neyînî ve dibe efsaneyeke gerdûnî. Ji ber ku gelek tiştên dijhev wekî: jîn û mirin, baş û xirap, xweza û çand, zanyarî û cehaletê di nav xwe de bi hev re dihevîne, dubendîyên hebûna mirovahîyê bi zimanekî sembolîk îfade dike. Awayên (versîyonên) efsaneyê yên cuda di nav dîrok û çandan de cuda cuda teşe girtine (Stone, 2024). Her çiqas hin cudahî, yan jî guherîn tê de hebin jî Efsaneya Şahmaranê piranî taybetmendî û sembolîzma xwe parastîye (Deniz, 2024; Liuba, 2024). Ev rewşa bandora efsaneya ya ku li ser nirxên civakî û di nav çanda devkî de cihê vê yê qahîm nîşan dide. Şahmaran semboleke çandî, îfadeyeke nasnameyê û rexneyeke civakî ye (Akgün Çomak & Pembecioğlu, 2018; Deniz, 2021, 2024). Şiroveyên efsaneyên yên di çandên cuda de, rolên zayenda civakî, dîn, mîtolojî û di derheqê baweriyên çandî de agahîyên girîng dide (Kara, 2019).

Ev efsane îro jî di nav gel de tê vegotin. Îro tenê wekî efsaneyeke mîtolojîk ne, heman demê de, di jîyana hemdem (modern) de jî bi awayekî sembolîk, hêzê temsîl dike. Armanca me ev e ku di vê xebatê de lêkolînê li ser koka dîroka Efsaneya Şahmaranê bikin. Li ser erdnîgariyên ku ev efsane lê tê gotin, li ser wateya sembola Şahmaranê guherînên ku îro di efsaneyê de pêk hatî, çi ne? Taybet jî di efsaneyê de çi taybetmendîyên Şahmaran û jinê yên wekhev hene? Motîfên ku jinê temsîl dikin çi ne? Ew xebate dê wateyên sembolîk yên Şahmaranê, şîroveyên matrîyarkal û baviksalarî, rîtûelên ku di efsaneyê de cih digirin, sembol, qadên pîroz lêkolîn biket û têkilîya van pêveyan û ya bi civakên ku di Rojhilata Navîn re derxe holê. Yek jî şibandin û cudahîya di nav bera awayên cuda yên efsaneyê dê bê vedîtin. Efsaneya Şahmaranê di nav cureyên çandî de, alîyên vê yên gerdûnî û xweser ve dê bê nirxandin. Her wiha motîfên ku

bawerîyê temsîl dikin çi ne? Di navbera jin û Şahmaranê de çi tiştên wekhev hene? Ji aliyê fîzîkî, bawerî, hestîyarî, zanebûnê ve. Her wiha di bawerîyan de, baweriyên mîtolojîk, çandî, tesawufî taybet jî di îslamîyetê de çi tiştin ku di kesayeta Şahmaranê de heyî, di dîn de jî hene? Ew motîfên di Efsaneya Şahmaranê, jin û dîni de hevpar di nava civakê de çawa cihê xwe girtine û çawa civak jê bandor bûye. Armanca vê xebatê ew e ku rola înşakirina nasname û di nav çanda devkî de bandora mayîn de peyda biket.

**1. Xebatên Wêjeyî**

Efsaneya Şahmaranê di bîra civakên Rojhilata Navîn de xwedî şopên kûr, efsaneyeke dewlemend e û hem motîfên jinê hem jî yên bawerîyê di xwe de dihevîne. Lîteratûr wan motîfane ji alîyekê ve bi mijadên erênî yên wekî; zanyarî, welidîn, bereket û nojdarîyê ve pênase dike, ji alîyekê ve jî mijadên wekî; îxanet, fedakarî û serhildêrî ve têkildar diket (Nicolaus, 2011; Baran, 2020; Deniz, 2024). Taybetmendîyên Şahmaranê hem yên nêrza (jinî) hem jî rola wê ya veguherînên civakî, bandora wê ya li ser rolên zayenda civakî, di wêjeyê de xwedî nîqaşên girîng e (Kara, 2019; Bor, 2022).

Wekî figûra jinê Şahmaran, taybet jî di mîtolojîya Kurdan de wekî semboleke nirxên matrîyarkal tê pênasekirin. Di vegotinên Kurdî de taybetmendîyên wekî, azadî, berxwedêr, jêhatî, afirînerî metaforên ku jinê temsîl dikin in (Yıldıran, 2001; Kara, 2019). Ji perspektîfa etîmolojîyê feminîstî de Kara (2019) Şahmaranê wekî figûra tekoşîn û hevgirtina jinan û sembola maran ya ku bi jinê ve tê têkildarkirin di vê qadê de xwedî wateyeke bi hêzdarî dinirxîne. Bor (2022) di mîtolojîya Kurdan de figûrên jinê tenê çandî ne, di heman demê de xwedî wateyên polîtîk û di bîra civakê de bi feraseta baviksalarîyê ve çawa hatîye guherîn niqaş dike. Di laşê Şahmaranê de hem derd hem derman, hem mirin hem jîyan û nojdarî bi hev re hene. Bi wan taybetmendîyên xwe ve hem jinê hem marî temsîl dike. Şahmaran bîranîna jina azad lê li îxanetê re rû bi rû mayî û hatî qetilkirin e. Şahmaran mîrateya alîyên civakê yên baş û xweşîk e. Îro jî ji bo tekoşîna jinan çavkanîyeke girîng e (Jineolojî, 2018) Lê lîteratûr nîşan dide ku figûrên jinan ji vî alî ve, divê bi çandên li Rojhilata Navîn yên din re zêdetir bê hevrûkirin (Rahbar & Masrour, 2019; Chupan, 2021).

Xebatên li ser motîfên dînî hatine kirin nîşan dide ku Şahmaran di pergalên bawerîyên herêmî heta ku bawerîyên piştî dînê îslamê de gelek veguherîn derbas krine. Lîteratûr li ser cihê pratik yê di pergalên bawerîyê rîtûel, qadên pîroz û kirina diayan de û di pergalên bawerîyê de cihê civakan de disekine (Akgün Çomak & Pembecioğlu, 2018; Rahbar & Masrour, 2019; Deniz, 2021). Taybet jî Jamshidbeigi (2022) di şaristanîya Elam de têkiliya marê pîroz û Şahmaranê û di folklora Kurdan de veguherîna vê motîfê berfireh vekirîye. Lê hate dîtin ku ev lêkolîne ji alîyê berîya îslamîyetê û heta piştî îslamîyetê, ji bo têkilîyên di navbera civakên cuda de lêkolîneke berfireh analîz biket, kêm maye (Chupan, 2021).

Ji alîyê çandî û civakî ve rola Şahmaranê ya di înşakirina nasnameya de û bandora wê ya di bîra civakî de, di lîteratûrê de xwedî ciheke berfireh e. Di vegotinên mîtolojîya Kurdan de, Şahmaran berxwedana civakan temsîl dike û di feraseta kolektîfbûna civakê xwedî ciheke girîng e (Emmanuel, 1969; Demir & Şahin, 2015; Bor, 2022). Denîz (2024) nîşan dide ku Şahmaran amûreke sembola berxwedana civakî û bîra herêmkî ye. (Rahbar & Masrour, 2019) figûra Şahmaranê di ritûelên rojane

temsîlîyeta dîtbarîyê de çawa cih digire, lêkolîn kirine. Lê dîsa jî lêkolînên li ser têkilîya efsaneyê ya ku bi civakên din yên Rojhilata Navîn re û hûrbûna li ser cureyên çandî û hevrûkirina wan de hêj jî sînordar in (Jamshidbeigi, 2022).

Dema ku em valahîyên lêkolînan dinêrin, em dibînên ki divê temsîlîyetên jin û motîfên dînî, bi şêvazê hevrûkirinê ve hêj berfirehtir bên lêkolînkirin. Sembola Şahmaranê ya jinê û wateya bawerîyê, di nav civatên civakê yên cuda de, çawa careke din hatiye avakirin; ev pêveyene di mîtolojîya Kurdan de çawa hatîye parastin û guherîn hêj jî alîyê bersivandina van pirsane ve xebat kêm in. Armanca vê xebatê ew e ku ev valahîyên ku me behs kirî tuji biket û wateya efsaneya Şahmaranê ji alîyê civakî û çandî ve hêj hûr û kûrtir lêkolîn biket.

**2. Rêbaz**

Armanca vê xebatê ew e ku di Efsaneya Şahmaranê de Motîfên jinê û yên bawerîyê derxe holê. Wekî rêbaz, analîzkirina gotaran, komkirina xebatên etnografîk û analîzkirina sembolên mîtolojîk bîne berhev û di nav bera wan xebatên qadên cuda de hevparî û girêdanan lêkolîn biket. Di her asta xebatê de ev rêbaze hat bikaranîn. Hedefa vê xebatê ew e ku ji alîyên cuda ve Efsaneya Şahmaranê hûr û kûr bide fêmkirin.

Ji bo vê xebatê pêşîyê lêkolîn li ser xebatên di vê qadê de hatine kirin, gotarên akademîk, tez û gotarên devkî bi awayekî berfireh hatin lêkolînkirin. Efsaneyên li ser Şahmaranê li kîjan erdnîgarîyan derbas dibin hat lêkolînkirin. Erdnîgarîyên ku Efsaneya Şahmaranê tê vegotin de, di nav bera vegotina efsaneyan de çi cudahî hene, hatin hevrukirin. Analîzkirina gotaran ji bo motîfên jinê û yên bawerîyê çawa hatine vehandin, hat bikaranîn (Krippendorff, 2018). Ziman, sembol û honandina efsaneyê bi awayekî pergalî hatine kodkirin û bi lêkolînên tematîk hatine analîzkirin (Braun & Clarke, 2006). Di nav efsaneyê de, li ser rola kesayeta jinê, metaforên ku hatin bikaranîn û fonksîyona hêmanên dînî bi awayekî kûr hatiye sekinandin. Di pêvajoya analîzê de materyalên ku li ser berhemên nivîskê yên di derheqê folklora Kurdî û li ser vegotinên gel, esas hatine girtin. Piştî van analîzane, ji bo ku têkilîya efsaneyê ya bi çanda kurdî ya hemdem bi civakê re çawa ye û da ku şiroveyên wê bên fêmkirin rêbazên etnokrafîk hatin bikaranîn. Daneyên etnografîk ên hatine berhevkirin di çarçoveyek tematîk de hatine analîzkirin û bi vedîtinên bi gotaran ve hatine girêdan (Geertz, 2020).

Herî dawîyê, ji bo tehlîlên kûr ên rehendên wateyê yên efsaneyê analîzên mîtolojîk û nîşaneyî (sembolîk) hatin kirin. Di vê pêvajoyê de, wateyên arketîp ên figûra jinê ya di efsaneyê de û rola motîfên dînî di çarçoveya çandî de hatin nirxandin. Wateya mîtolojîk ya sembolên wekî, Şahmaran, mar û cîhana binerdê, di bin banê teorîya Jung ya arketîp û analîza Elîadeyê ya mît û sembolan de hat lêkolînkirin û piştre jî hatin nirxandin. Her wiha têkilîyên di navbera motîfên dînî yên efsaneyê û bawerîyên herêmî û Îslamê de hatin lêkolînkirin. Hedefa vê analîzê ew e ku hem di çanda Kurdî de cihê efsaneyê hem jî têkîlîya wê ya bi temayên mîtolojîk ên gerdûnî re derxe holê (Jung, 1988; Campbell, 2008; Eliade, 2023).

Bi girêdana hemû daneyên berhevkirî bi hev re vekolînek piralî hate kirin û têkilîyên di navbera fîgura jinê û motîfên dînî de ji perspektîfek navdîsîplînkî hate şîrovekirin. Ev nêzîkatîya metodolojîk bo sedem ku mîrov cîhana sembolîk a dewlemend ya efsaneya Şahmaranê hem di çarçoveya dîrokî û hem jî ya hemdem de binirxîne.

## 3. Vedîtın Û Nîqaş

### 3.1. Lêkolînên li ser Motîfên Jinê

Motîfên jinê yên ku di efsaneya Şahmaranê de gelemperî, dîtbarî, nojdarî, fedakarî û berxwedêrî ye. Di hin cureyên vegotina efsaneyê de jî behsa evîndarîyeke di nav bera şahmaran û Camşab jî tê kirin. Dema ku mirov li ser koka efsaneyê lêkolînê dike mirov hem dîrokeke dirêj hem jî şibandina xwedavenda, şahmaran û jinê peyda dike. Wekî Tahsman, Medusa û Şahmaran. Mar di dîroka mirovahîyê de gelek kevnar e. Hemen hemen di hemû serdeman de wêneyên maran li ser dîwarên şkeftan û keviran hatîye çêkirin. Girê Xerabreşkê (Riha) ya ku xwedî dîrokeke 12 hezar salan de gelek wêneyên maran li ser keviran hatine çêkirin hene (Çakırtaş, 2021). Her wiha wêneyên Xwedavendayan jî xwedî dîrokeke kevnar in. Hin xwedavenda bereket û welidîne (Înanna û Kîbela), nojdarîyê (Gula Bau) zanyarîyê ango TIP'ê ( Îsîs), xweşikî, hêz û şervanîyê (Hathor, Star yan jî Îştar) zewac û evînîyê (Înanna) temsîl dikin. Her wiha xwedavendayên ku îxanet lê hatî kirin jî (Tîamat, Înanna) hene (Kolektif, 2017). Bi hemû van taybetmendîyên ku di şexsê Şahmaranê de kom bûne, di dîroka çanda xwedavendatîyê û taybetmendîyên jinê yên ji alîyê civakê ve hatine qebûlkirin, hevdu temam dikin.

Dîtbarî: Şahmaran ji alîyê dîtbarîyê û xemla xwe ve wekî jinê ye. Kevilê vê wekî cil û bergê jinan rengorenk e. Heta navtengê jin û ji nav tengê pê de jî mar e. Şahmaran bi xweşikiya xwe ve wekî jineke gelek xweşik e. Ji ber wê wekî Keybanû jî tê binavkirin (Efsaneya Şahmaran, 2019). Şahmaran her çiqas di kêm gotinan de ji alîyê zayendê ve wekî nêrza ( ji ber ku hevalnavê Şah ji bo mêran tê bikaranîn) bê pênasekirin jî, gelemperî wekî jin hetta jineke xweşik tê qebûlkirin. Ji xwe di alîyê dîtbarîyê ve jî wekî jinekê ye. Çavên wê kildayî û di stûyê wê de morik yan jî xendeqok hene. Li Îranê û li Mezopotamyayê çavkildana jinan xwedî dîrokeke kevnar e û her wiha morik û xendeqokên ku jinan bi destê xwe çêkirî jî xemleke girîng e. Heman xemil di wêneyên Şahmaranê de, di stûyê wê de jî hene.

Dema ku mirov behsa çandê dike gelek tişt tên bîra mirov. Çand hemû tiştên ku di destpêka mirovahîyê de heta îro ji bo pêdivîyên mirovan û ji alîyê mirovan ve hatine afirandin, hem tiştên maddî û hem jî yên manevî ne (Bayram, 2018). Ji wan tiştan yek jî xebatên destan in. Jinan ji bo mala xwe bixemilînin wêneyê Şahmaranê li ser etemîn, qenevçan nexşandine. Her wiha li ser berik, cacim û mehfûran jî motîfa Şahmaranê dihate çêkirin û niha jî tê çêkirin. Di nav cihêzê bûkan de ji bo ku jîyaneke bi aram, bi şans û bereket bijîn, wêneyek Şahmaranê dihat danîn.

Li Mêrdînê bi salane wêneyê Şahmaranê li ser textan bi teknîka sotinê ve tê çêkirin. Ew teknîke niha jî tê bikaranîn. Gelek jin jî di kargehan de bi vê teknîkê wêneyê Şahmaranê çê dikin. Niha li ser camê bi boyaxkirinê ve jî wêneyê Şahmaranê tê xêzkirin (Çakırtaş, 2021). Li Îranê û li Mezopotamyayê wêneyê Şahmaranê li ser gelek amûr û alavan tê çêkirin. Wekî; poşî, kiras û fistan, şarpe. Li ser amûrên mûzîkê jî tên çêkirin. Exlebe li ser erbaneyan. Her wiha li ser alavên nava malê jî tên çêkirin. Wekî bintas, zêrcam (sînî) hwd.

Şahmaran, Ji alîyê hestîyarîyê ve wekî jinekê ye. Her çîqas ji alîyê mêrekî ve li îxanetê re rû bi rû maye jî, ji ber ku dizane bi zordarî li wî kesî ango Camşab hatîye kirin

wî efû dike. Hemû zanînên xwe ji bo ku ji mirovahîyê re xizmet bike, derbasî Camşab dike. Dizane ku pêdîvîya mirovahîyê dê bi wan zanînan hebe. Piştî mirina xwe jî dest ji qencîyê bernade. Li gorî hin gotar û vegoteran Camşab Lokmanê Hekîm e (Yeşilyurt, 2018). Bi sedan salan mirovahîyê sûd ji şîfakarîya Lokmanê Hekîm vergirtî ye û hê jî verdigire. Mar hêzê û têkiliya bi xwezayê re jî temsîl dike. Di serdema Neolîtîk de, di dema xwedavendayan de mar gelek caran gel xwedavendayan dîhar e. Ew tê wateya hêzê û têkilîya jinê û xwezayê. Ango jin hêzdar e û hêza xwe ji xwezayê digire. Heman demê de hin taybetmendîyên jin û marî temsîl dike. Mirov dikare ji bo mînak xwedavendayên Mezopotamyayê Tîamatê, Stêrk (Star), Înanna û hwd. bidet (Kolektif, 2017).

Hest û Raman: Şahmaran hem şifakariyê, hem bereketê, hem hestîyarîyê, hem zanyarîyê, hem razdarîyê (efsûnîyê) hem jî hêzê di kesayeta xwe de dihewîne. Heman tişt ji serdema Neolîtîkê heta îro di kesayeta jinê de jî temsîlîyeta xwe dibîne. Ji ber rolên jinê yên bîyolojîk xwedî şefkat û merhametê ye. Dema ku mirov çîroka Şahmaranê dinêre heman hest di kesayeta wê de jî hene. Her çiqas nîv mar be jî, defsa ku zirarê bide mirovan, şîfa daye wan. Mar û jin her du jî welidînî, bereketê, têkilîya bi xwezayê re temsîl dikin (Soysal & Yıldız, 2018). Şahmaranê hemû zanyarîya xwe derbasî Lokman Hekîm yan jî Camşab kirîye. Bi wê kirina xwe ve jiyan daye domandin, ango heyat daye mirovan. Heman tişt di kesayeta jinê de jî heye. Jin zarokan tînin. Di bedena xwe de xudan dikin. Piştî tên dinyayê bi şîrê memikên xwe ve têr dikin. Ew bi xwe bimirin jî jiyan saya wan berdewam dike.

Şahmaran ji ber ku nîvî mar e û mar kevilên xwe diguherin û bedena xwe nû dikin. ji ber wê ye mar di TIP' de jî sembola şîfayê ye. Heman tişt di bedena jinê de jî heye. Her mehê dema ku dikevin nav cilan (regl dibin) xwîna di bedena wan de xwe paqij û nû dike. Her wiha dema ku diwelidin (zarokan tînin) hemû bedena wan ji alîyê fîzîkî û hestwarîyê ve xwe nû dike. Şahmaran ji ber ku taybetmendîya xwe ya nîvî mirov nîvî mar, di navbera xwezayê û mirovan de dibe pirek. Jin jî ber ku têkilîya wê ya bi xwezayê re, nebatan re, çandinîyê re di nav jiyan û xwezayê de dibe sedema domdarîya jîyanê (Bulut, 2024).

Serhildêrî: Şahmaran her çiqas hestîyar be jî di heman demê de serhildêr e jî. Her wiha jin jî çiqas bête tepesekirin, çiqas li ser jînê tundî hebe jî, ewqas jî serî radike li hemberî zordarîyê. Zîrektir û hêzdartir dibe. Bi vê serîrakirina xwe ve bawerîya wê bi xwe tê zêdetir dibe (Soysal & Yıldız, 2018). Taybetmendîyên hestewarî, pêbawerkirin fedakarîyê ji alîyê civakê ve wekî taybetmendîyên jinê tên qebulkirin. Ew taybetmendîyene di fîgûra şahmaranê de jî tên temsîlkirin.

Li gorî bawerîya Xiristîyan û Mûsevîtîyê, dema ku Hz. Adem hatîye afirandin gel wî jineke bi navê Lîllith jî hatîye afirandin. Ji aliyê Xweda ve hatîye emirkirin ku Lîllith serî li ber Adem bitewîne û îttatê ji bo wî biket. Lê Lîllith qebul naket. Dibêje ez jî wekî Adem bi heman şertan ve hatime afirandin û ez û ew wekhev in. Piştî wî emrî Lîllith beheştê û Hz. Adem terk dike û diçe dinyayê. Li gorî dilê xwe dijî. Piştî çûyîna Lîllithê bêhna Hz. Adem gelek tengav dibe. Dixwaze Lîllith dîsa vegere lê Lîllith qebûl naket. Pişt re xweda Havvayê ji perasîyeke Hz. Adem ya xwar ve diafirîne. Havva berovajî Lîllithê jineke îttatkar e. Serî li ber afirînerê xwe û Adem ditewîne. Her gotin û xwestekên Adem

pêk tîne. Lê di dawîyê de ji alîyê Îblîs û marî ve tê xapandin. Sêva ku ji bo wan hatîye qedexekirin dixwe. Hevva hem sêvê dixwe hem jî Adem îkna dike û bi wî dide xwarin. Piştî wê bûyerê her du jî ji beheştê têne avêtin (Sallmann, 2005). Dema ku mirov vê çîroka Adem û Hevvayê dixwîne yan jî guhdar dike mirov digehe encameke ku îro jî di hemû civakan de hêj jî heyî. Ango di civakê de sûcên tên kirin sedema wê jin tê dîtin. Ew bingeha vê gunehkarî ji Adem heta îro heye. Sedema ku zeîftîya Adem nîşan dayî Hevva tê sûcdarkirin.

Ji ber ku bêemrîya xweda dike Lîllith tê cezakirin. Cezayê wê jî kuştina zarokên wê ye. Ji ber êş û jana bezirkirina zarokên xwe Lîllith bi maran û şeytanî re dibe hevkar û zûrîyeta ku ji Hz. Adem û Hevvayê çêdibin dikûje. Wekî encam ji ber ku Lîllîthê wekhevîyek di navbera xwe û Hz. Adem de xwastî, jîyaneke bi dilê xwe xwastî wekî şeytan û hevala maran hatîye pênasekirin. Ew jî rewşa jinên ku serdestîya mêrî qebul nakin, feraseta baviksalarîyê red dikin, jîyaneke wekhev dixwazin tîne bîra mirov. Gelek jin ji ber van xwestekên xwe tên cezakirin û kuştin. Ew rewşa jinan heta îro jî berdewam e (Gökduman, 2020).

Hin taybetmendîyên ku di civakan de ji bo jinê tên qebûlkirin wekî; fedakarî, hestyarî, zanyarî, serhildêrî. Ew taybetmendîyene di figûra Şahmaranê de jî hene. Ji xwedavendayan heta îro, di hemû civakan de jin serî li hemberî neheqîyê radikin ango serhildêr in. Wekî şerê Înanna û Enkî, Tîamat û Marduk (Kolektif, 2017). Her wiha di Îslamîyetê de tevlîbûna Hz. Ayşe ya şerî, di tekoşînên azadîya civakên li gelek deverên cîhanê jinên şervan navê xwe li dîrokê kirine. Taybetmendîyên jinê yên serhildêr di kesayeta Şahmaranê de jî tê temsîlkirin. Dema ku ji şkeftê tê derxistin ji marên din re (li gorî hin riwayetan ew mar keçên wê ne) dibêje heke ez rojekê venegerîyam, derkevin ser rûyê erdê tola min hildin.

### 3.2. Lêkolînên li ser Motîfên Dînî

Motîfên dînî di efsaneya Şahmaranê de li derdora hêmanên binerd, zanyarî û nojdarîyê tên qebûlkirin û ew taybetmendîyene ji alîyê gel ve wekî pîroz tên dîtin. Di vê beşê de, motîfên bawerîya ku di efsaneyê de bi awayekî berfireh hat lêkolînkirin û têkiliya cîhana binerd de, rola şîfakarîyê, di ritûelan de cihê wê û şîretên sincî (exlaqî) hatin analîzkirin. Her wiha armanceke vê xebatê jî ew e ku, ji bera îslamîyetê û pişt îslamîyetê veguherînên ku di efsaneyê de pêk hatî, ew motîfene çawa careke din bûye xwedî wate û di bîra gel de çawa mayîn de bûne, derxe holê.

Cîhana Bin erdê û Pîrozî: Di efsaneya Şahmaranê de cîhana bin erdê motîfa serke ya ku Şahmaranê dike gîyanewereke serxwezayî. Di efsaneyê de tê gotin ku Şahmaran di şkeftan de dijî û di bin erdê de bi zanyarîyê, şîfa û welidînê ve tê pênasekirin. Ev vegotine bi feraseta di mîtolojîya Mezopotamya û Rojhilata Nêzîk de, binerd wekî “bingeha zanyarî û ji nû ve zayînê” ve tê girêdan ango dişibin hev (Yıldıran, 2001). Motîfa marî jî di vê peywendê ve watedar dibe. Ji ber ku mar, semboleke qedîm ya ku çembera di nav bera mirin û jîyanê de temsîl dike ye (Jamshidbeigi, 2022).

Vedîtin, di gotinên Kurd de şkeft wekî mekanên Şahmaranê yên pîroz tê dîtin û ev mekanene xwedî cihên taybet yên pratîkên ritûelan tên qebûlkirin (Rahbar & Masrour, 2019). Vegotin, şiroveyên taybet li kanîyên avê û şkeftên bin erdê de wekî “çavkanîya jîyanê” û “nîşana welîdînê” piştgitî dikin. Di lîteratûrê de ev rewşe bi çanda

xwedavendîyê ya ku bera îslamîyetê ve tê girêdan û parastina pîrozîya wan mekanan bi rêya Şahmaranê ve tê domandin (Deniz, 2021). Ji bo nîqaşê cîhana di bin erdê de, efsaneyê tenê vekî vegotinekê zêdetir, wê di çarçoveya dînî û çandî de dike ciheke sembolîk ya di navbera mirov û xwezayê de.

Nojdarî û Zanyarî: Taybetmendîyên Şahmaranê yên nojdarîyê wê di bawerîyên gelan de wekî "Figûreke nojdar" Li gorî efsaneyê bedena Şahmaranê bi tiştên ku şîfayê dide mirovan ve tûje ye û ew şîfa, di zanebûnên gel yên tibbî de xwedî ciheke girîng e. Şahmaran wekî "Hebûneke parazvan" di dia û ritûelan de cih digire. Ew jî di bawerîya gel de cihê xwe yê girîng nîşan dide (Emmanuel, 1969; Deniz, 2021). Li Anadoluyê wêneyê Şahmaranê bi armanca ji nezerê bên parastin û bereketê bîne bi dîwarên malan ve tên daliqandin. Ew rewş di nav gel de wekî "wateyeke manevî" tê qebulkirin (Rahbar & Masrour, 2019).

Alîyê Şahmaranê yê zanyarîyê jî ji bo mirovan wekî rêbereke sincî (exlaqî) ye. Di efsaneyê de zanyarîya wê rêya rast û ji xirabîyê dûrketinê nîşanî mirovan dide. Lê ew zanyarî bi xwe re, ji bo têkilîya bi mirovan re ezmûnekê jî bi xwe re tîne. Îxaneta ku Şahmaranê hatî kirin bûye sedema "cerabeyeke exlaqî" ji bo "fedakarî û qencîyê" (Yıldıran, 2001; Kara, 2019). Di vê xalê de nîqaş hem li ser du alîyan ve diçe. Yêk, ji alîyê ku Şahmaran di nav gel de wekî "nojdarî" û ya din jî alîye ku wekî rêbereke sincî ve disekine. Ev mijadene, nîşan didin ku ji bo kes û civakê dibe rêber.

Ritûel û Pratîkên Dînî: Efsaneya Şahmaranê rasterast bi pratîkên rîtûel û pêkhateyên dînî yên ku di nav gel de tên kirin ve girêdayî ye. Ji ber ku di efsaneyê de Şahmaran di şkeftan de jîya ye, ew şkeftene wekî cihên pîroz tên qebulkirin û bûne "qadên ritûelan" Di ritûelan de ji Şahmarani dia tên kirin û qurban tên dayîn. Ew rewşe nîşan dide ku Şahmaran di nav gel de wekî "Hebûneke parazvan û nojdar" tê qebulkirin (Rahbar & Masrour, 2019; Deniz, 2021). Taybet jî li herêma Mahabadê ji bo ku ji nezerê û ji nexweşîyan bên parastin gel diayan li ser navê Şahmaranê dikin û sembolên ku wê îfade dikin bikar tînin.

Têkiliya Şahmaranê ya bi avê re jî rola wê ya ku pratikên dînî de piştgirî (qahîm) dike. Ji ber ku av wekî çavkanîya bingeha jîyanê tê dîtin, dibe sedema ku Şahmaran bibe sembola welidîn û bereketê. Ev vedîtine ji bera îslamîyetê çanda xwedavendayan û di nav gel de bi baweriya îslamîyetê ve girêdana vê nîşan didin (Jamshidbeigi, 2022). Ji bo niqaşê di ritûelan de figûra Şahmaranê, ji bo lêgerîna peywedîya hêzên neasyî re tê nirxandin û di bîra civakê de mayîndeya xwe berdewam kirîye.

Şahmaran wekî figûreke mîtolojîk nîvî mîrov nîvî mar e. Xwedî zanebûn û razên efsûnî ye. Bi wan taybetmendîyên xwe dişibe ewlîya û pêxemberan. Ango ew taybetmendîyên wê ewlîya (xizir) perî, ezîz û pêxemberan tîne bîra mirov. Dema ku Şahmaranê dixwast dikarî bi temamî xwe bike mirov û bikeve di nava gel de. Kesên ku pêdivîya wan bi alîkarîyê re heyî ango bi kesên bendewar re dibû alîkar (Efsaneya Şahmaran, 2019). Her wiha Şifakarîya Şahmaranê mucîzeyên Hz Îsa tîne bîra mirov. Li gorî baweriya Xiristîyanîyê Hz. Îsa çavên kesên kor e vekirine. Şîfa daye ber kesên ku nesaxîyên giran pê re hene (İncil: Yuhanna 9, no date).

Di bawerıya kurdan ya qedim Zerdûştîyê de jî mar xwedî ciheke girîng e. Li gorî rîvayetekê rojekê Hz. Zerdûşt li cihekê bi xew re diçe. Marek tê bi stûyê wî vedide. Hz. Zerdûşt ji xew radibe, lê dinêre ku marekî ew hîşyar kirîye. Mar dema ku li çavên Hz. Zerdûşt dinêre wî nas dike û peşêman dibe. Hz. Zerdûşt dibêje marî 'spas dikim ku te ez ji xewê hişyar kirim. Ji ber ku rêya min dirêj e''. Marî şerm ji xwe kirîye û gotiye Hz. Zerdûşt 'êdî rêya te kurt e. ji ber ku jehra min kujer e.' Hz Zerdûşt gotîye bi jehra marekî ve dêwek namire. Lê dîsa jî jehra xwe paş ve bikêşe ji ber ku tu ew qas dewlemend nîn î' marî dîsa devê xwe avête birîna Zerdûşt û jehra xwe paş ve kêşaye. Di encama vê bûyerê de Hz. Zerdûşt ji kesên ku jê bawer dikin re gotîye '' Kesên xirabîyê li we dikin, hûn qencîyê lê nekin ku wan neden şermê. Wan kesan îkna bikin ku xirabî li we nekirîye' (Nietzsche, 2021).

Mar hem di mîtolojîyê de hem jî di bawerîyan de, xwedîyê gelek wateyan e. Di bawerîya îslamîyetê da mucîzeya ku esaya Hz. Musa dibe mar û di baxçeyê biheştê de hebûna marî, di mîtolojîyê de li ser mil û serê hin xweda û xwedavendayan hebûna maran hevdu tînin bîra mirov. Ji ber ku Şahmaran nîvî mar e hem zanyarîyê hem jî xofê temsîl dike. Ew rewş dîsa di bawerîyên mîtolojîk de dema ku mirov xirabîyê dikin ji alîyê xweda û xwedavendayan ve tên cezakirin û dema qencîyê dikin jî tên xelatkirin. Heman tişt ji bo bawerîyên yekxwedayî jî derbasdar e. Dema ku mîrovan tişteke baş kir bi beheştê ve tên mûkafatkirin dema ku xirabî kirin jî bi agirê cehnemê ve tên tirsandin (Êsî, Girdarî û Bêrkevanî, 2016). Ew rewşa Şahmaran û bawerîyan, hevdu tînin bîra mirov.

Bedena Şahmaranê piştî mirina wê dibe kanîya şîfayê. Her çiqas jiyana xwe ji dest dabe jî, bûye sedema başbûna hin kesên din, Ango bûye qurban lê heman demê de ji bo qral yan jî Camşab bûye sedema silametî û jîyanê. Ew jî di bawerîyên serdemên xweda û xwedavendayan de dema ku bûyerên xwezayî (Lehî, erdhej, renî, tofan û hwd.) pêk dihatin mirovan ji bo ku xweda yan jî xwedavendayên wan, ji wan hêrs nebin, kêmasîyên wan efû bikin, qurban didan. Her wiha di îslamîyetê de jî ev meseleya qurbandayînê ji Hz. Îbrahîm ve dest pê kiriye û heta îro jî di nava civatên ku ji îslamîyetê bawer dikin û ew çand berdewam e (Êsî, Girdarî û Bêrkevanî, 2016). Li gorî hin gotar û vebêjeran dema ku Şahmaran ji mekana wê tê derxistin, ji maran re dibêje ez dê biçim davetê. Heke ku rojekê dengê diholê birya û ez venegerim, hûn bizanin ku ez hatime kuştin. Wê gavê hûn jî derkevine ser rûyê dinyayê her derê îstila bikin. Ew rewş qîyameta ku bawerîyên yekxwedayî de tîne bîra mirov.

Hînkirinên sincî û motîfên ezmûnê: Peyama efsaneyê ya dawî, nijadên l derdora "ezmûna sincî" û "fedakarîyê" teşe digirin. Vedîtin nîşan didin ku her çiqas îxanet li şahmaranê hatibe kirin dîsa jî wekî hebûneke ku sûdê dide ye. Ew jî alîyê efsaneyê yê exlaqî kûrtir diket. Di vir de têgehên wekî, bawerî, sedeqet û îxanetê nîşan didin ku mirov ji ezmûneke sincî re tên derbaskirin (Kara, 2019; Deniz, 2021). Şahmaranê bawerîya xwe bi mirovan anîye û pişt re bi îxanetê re rû bi rû ma ye. Di encama wê bawerîya ku bi mirovan anîye de jiyana xwe ji dest daye. Ango bûye sedema mirina vê. Ew mijare bûyera Adem û Hewayê ya ku ji beheştê hatine avêtin tîne bîra mirov. Îxaneta ku Cemşabî li Şahmaranê kirî di gelek buyerên dînî de derbas dibin. Ew jî ji alîyê exlaqî ve dersekê didin.

Zanyarîya Şahmaranê û piştî mirina vê jî nojdarîya wê, ramana li hemberî xirbîyê dê qencî ser bikeve, pêş têxe. Ev hînkarîye kirpandinekê li ser hem berpirsyarîya sincî ya kesane hem jî hevgirtin û paqijkirina civakî dike. Di wêjeyê tê gotin ku ev alîyê Şahmaranê di nav gel de wekî "rêberek etîk" tê qebulkirin û ragihandina efsaneya ya ji bo nifşên din hêsan kirîye (Yıldıran, 2001).

Veguherîna Berîya Îslamîyetê û ya Pişt Îslamîyetê: Efsaneya Şahmaranê berîya îslamîyetê li Îran, Mezopotam ya û li Anadoluyê, ji baweriyên cuda bandor bûye. Piştî serdema îslamîyetê, bi şiroveyên îslamîyeta gel û ya tasawufî ve ji nû ve teşe girtîye. Berîya îslamîyetê  şahmaran bi xweza, av û zayînê ve hatiye têkildarkirin. Şahmaran bi rêya sembola marî ve bingeha jiyanê û ji nû ve welidînê temsîl dike (Yıldıran, 2001; Jamshidbeigi, 2022).

Di efsaneyê de şkeftin di bin erdê de û kanîyên avê wekî cihên pîroz tên pênasekirin. Ew cihene berîya îslamîyetê di çanda xwedavendatîyê de jî pîroz bûn û cihê ritûelan bû. di efsaneya Şahmaranê de jî hebûna heman tiştan bi çanda xwedavendatiyê ve tê girêdan (Yıldıran, 2001; Deniz, 2021). Di serdema piştî îslamîyetê jî efsaneya Şahmaranê bi bandora îslamîyeta gel û tasawufî ve ji nû ve hatîye şirovekirin. Nijadên zanyarî, nojdarî û rêbertîyê derketine pêş. Şahmaran wekî rêbereke ku rêya rast nîşan dide û figûreke sincî nîşan dide (Akgün Çomak & Pembecioğlu, 2018). Şahmaran ji ber ku zanyarî hînî mirovan kirî û nojdarîya ku ji laşê wê hatî ve bûye sembola fedakarî û paqijîya sincî. Piştî mirinê jî şîfadayîna Şahmaranê di bawerîya tesawûfî de wekî paqijî û ezmûnê tê şirovekirin û peyama ku cîzakirin û xelatkirinê daye (Kara, 2019; Deniz, 2024). Ev veguherîne nîşaneya vehandina îslamîyeta gel û ya bawerîyên herêmî ye. her wiha bûye sedema ku figûra Şahmaranê di çand û bawerîyê de mayînde bibe.

Cihê ku Şahmaran û marên din tê de dijîn her çiqas di binê erdê de be jî ciheke xweş e. Xwedî xizîneyên gelek dewlemend e. Mirov çi dixwaze dikare li mekana ku Şahmaran lê dijî bi dest pêxe. Di wê mekanê de xweşikî û aramî heye. Ew mekan biheşta ku dînên yek xwedayî û pirtûkên pîroz de tên pênasekirin, tîne bîra mirov. Wekî encam bi gelemperî motîfên bawerîyê yên ku di efsaneyê de, Şahmaranê di nav gel de wekî figûreke parazvan, rêbereke sincî û kanîya nojdarîyê pênase kirîye. Ev motîfên ku bi cîhana bin erdê de, bi ritûelan û bi hînkarîyên ve teşe girtî, ji berîya îslamîyetê çanda xwedavendîyê heta ku îslamîyeta gel û şiroveyên tasawufî domdarîyekeê nîşan dide. Bi rêya wan agahîyane mirov dibîne ku Şahmaran tenê efsaneyeke mîtolojîk nîn e. Di heman demê de wekî parçeyeke candar ya bîra kolektîf wate girtîye.

**ENCAM**

Armaca vê xebatê, lêkolîna li ser di efsaneya Şahmaranê de figûrên jinê û yên dînî, ji alîyê civakî, çandî û dîrokî ve li ser kûrbûn e û ji her alîyê ve fêmkirina efsaneyê ye. Figûra jinê her çiqas taybetmendîyên bingehîn; welidîn, zanyarî û fedakarî temsîl biket jî ji bilî wan taybetmendîyane, perspektîfeke rexneyê ye ya ku  li ser rolên zayenda civakî û ezmûnên exlaqî. Figûrên dînî jî ji bo ku efsane wekî vegotineke pîroz bê fêmkirin bi hin hêmanan wekî; cîhana bin erdê, nojdarî û zanyarî, pratîkên ritûel û hînkarîyên exlaqî ve wateya efsaneyê kûrtir kirîye.

Ji alîyê figûra jinê ve efsane hem ji alîyê takekesî hem jî yê civakî ve wekî rêberekê hatîye pênasekirin. Hebûna wê ya di cîhana bin erdê de bi taybetmendîyên wê

yên welidîn û zanyarîyê ve tê girêdan û alîyê jinê hem ya hilber (afirîner) û hem jî ya parazvan ve pêş dikeve. Lê piştî îxanet lê tê kirin jî dîsa fedakarîya wê, nîşan dide ku di hemû qonaxên efsaneyê de rolên zayenda civakî çawa tên lêpirsîn. Şahmaran ji alîyekê ve rolên civakî yên dîrokî temsîl dike ji alîyê din ve jî ji wan rolane jî derbas dibe û figûra jinê wekî dike semboleke hêzdar. Ev veguherîne bûye sedema ku efsane di girêdanên çandî yên cuda de careke din bê şirovekirin û fîgûra jinê di bîra kolektîf de piralî bibe.

Ji alîyê figûrên bawerîyê ve cihê Şahmaranê yê di baweriyên gel ya pîroz de, bi cîhana di bin erdê û şîfakarîya wê ve girêdayî ye. Şîfakarîya ji bedena wê hatî û taybetmendîyên zanyarîya wê bi zanista tenduristîya gel û pratîkên ritûelîyê ve bûne yek. Ew bûye sedema ku Şahmaran di nav gel de bibe figûreke parazvan û rêbera sincîyê. Ji alîyê berî ya îslamîyetê û piştî îslamîyetê rehendên efsaneyê yên dînî, ji çanda xwedavendatîyê heta îslamîyeta gel û pratîkên gel tasawûfî ve temsîlîyeteke domdar heye. Mayîndebûna wê ya di bîra kolektîf de wateya wê ya civakî xurtir dike.

Li Mezopotamyayê ango di nav civaka Kurdan de şahmaran di jîyana gel ya rojane de bi van taybetmendîyên xwe hemûyan ve ji rabirdoyê heta îro bandora xwe dide jiyan kirin. Di hem di dîroka jina Kurd, kesayeta wê, taybetmendîyên wê, nêrîna civakê ya li hemberî jinê, tekoşîn û berxwedêrîya wê de şopên Şahmaranê hene. Di heman demê de ew şopene di bawerîyan de jî derdikevin pêşiya mirov. Di gelek ritûelên baweriyan, wekî bawerîya îslamê ya gel û ya tesawufî de gelek şopên efsaneya Şahmaranê hene.

Wekî encam lêkolînên li ser efsaneya Şahmaranê di derheqê jîyana civakê taybet jî civaka Kurdan, di derheqê nêzîkatî û nêrîna jînê, şopên bawerî û efsaneyê yên hevpar hin agahîyên kûr û berfireh dane me. Figûra jinê ji alîyê rolên zayenda civakî û peywendîya efsaneyê, her wiha cihê motîfên dînî yên di bawerîya gel de, teşegirtina nasnameya çandî de ji bo niqaşên îro û pêşerojê wekî çavkanîyekê nîşan dide. Ji bo têgehiştina feraseta civatên cuda, pêşerojê xebatên ku li qadan bên kirin girîngin. Taybet jî bandora ritûelên di bîra gel de û figûra jinê de şiroveyên hemdem (modern), dibe ku rehendên efsaneya Şahmaranê yên cuda derxe holê.

Civakên ku dîroka wan herî zêde li ser folklorê dimeşe de efsane xwedî ciheke taybet in. Civaka Kurdan jî civakek bi wî rengî ye. Em hêvî dikin ku ji bo xebatên pêşerojê yên li ser Efsaneya Şahmaranê dê bê kirin re, bibe çirûskek.

## ÇAVKANÎ


- Akgün Çomak, N. & Pembecioğlu, N. (2018) 'The Mystical Heroic Symbol of the 21st Century: The Mermaid As The Symbol Of Charm And Secrets In Different Cultures', in. 7th Annual International Conference on Journalism and Mass Communications, Singapore, pp. 156–165.
- Baran, S. (2020) 'From Fairytale Character to Lost Goddess: The Archetypal Representation of Stepmother within Kurdish Folklore', in A. Korangy (ed.) Kurdish Art and Identity: Verbal Art, Self-definition and Recent History. De Gruyter, pp. 82–95. Available at: https://doi.org/10.1515/9783110599626-004.

- Bayram, M. (2018) Çand û Edebiyata Devkî ya Kurdan û Giringîya Arşîvandina wan, bianet.org. Available at: https://bianet.org/yazi/cand-u-edebiyata-devki-ya-kurdan-u-giringiya-arsivandina-wan-202467 (Accessed: 20 December 2024).
- Bor, O. (2022) Female Figures in Kurdish Mythology and Folklore. Indiana University.
- Braun, V. & Clarke, V. (2006) 'Using Thematic Analysis in Psychology', Qualitative Research in Psychology, 3, pp. 77–101. Available at: https://doi.org/10.1191/1478088706qp063oa.
- Bulut, R. (2024) Di Serdema Neolîtîk de Çand I, Il, xwebun2.org. Available at: https://xwebun2.org/di-serdema-neolitik-de-candil/ (Accessed: 20 December 2024).
- Çakırtaş, Ş. (2021) Kadın Ruhlu Bir Efsane: Şahmaran, Independent Türkçe. Available at: https://www.indyturk.com/node/306046/t%C3%BCrki%CC%87yeden-sesler/kad%C4%B1n-ruhlu-bir-efsane-%C5%9Fahmaran (Accessed: 18 December 2024).
- Campbell, J. (2008) The Hero with a Thousand Faces: Commemorative Edition. Third. Princeton: Princeton University Press.
- Chupan, S. (2021) 'Mythical reading - An Archetype of the Kurdish Story Shamaran', Research in Arts and Humanities, 1(33), pp. 53–40.
- Dalley, S. (2004) 'Near Eastern Myths and Legends', in J. Barton (ed.) The Biblical World. New York: Taylor & Francis, pp. 41–64.
- Demir, H. & Şahin, H. (2015) 'Reinterpreting The Story, "Shahmaran's Legs" by Murathan Mungan eith Reference to Values Education', Journal of Turkish Studies,10,pp.289–289. Available at: https://doi.org/10.7827/TurkishStudies.8886.
- Deniz, D. (2021) 'The Shaymaran: Philosophy, Resistance, and the Defeat of the Lost Goddess of Kurdistan', Pomegranate, the International Journal of Pagan Studies, pp. 221–248.
- Deniz, D. (2024) Shâmaran: The Neolithic Eternal Mother, Love and the Kurds. Lanham, Maryland: Lexington Books (Kurdish Societies, Politics, and International Relations).
- Efsaneya Şahmaran (2019) Bernamegeh. Available at: https://www.bernamegeh.org/destana-sahmaran/ (Accessed: 20 December 2024).
- Eliade, M. (2023) Kutsal ve Kutsal-Dışı Dinin Doğası. Translated by A. Berktay. Alfa Yayınları.
- Emmanuel, R. (1969) The Ring of Shah Maran, a Story from the Mountains of Kurdistan. Michigan: Interstate Printers and Publishers.
- Êsî, M.H., Girdarî, M.S. û Bêrkevanî, M.M. (trans.) (2016) 'Qur'ana Pîroz û Wergera Wateya wê ser Zimanê Kurdî'. İstanbul.
- Geertz, C. (2020) Kültürlerin Yorumlanması. Translated by H. Gür.
- Gökduman, T. (2020) Şahmeran'dan Lilith'e yılanlı kadınlar, Çatlak Zemin. Available at: https://catlakzemin.com/sahmerandan-lilithe-yilanli-kadinlar/ (Accessed: 20 December 2024).
- İncil: Yuhanna 9 (no date) İncil. Available at: https://incil.info/arama/Yuhanna+9 (Accessed: 20 December 2024).

- Jamshidbeigi, R. (2022) ‘The Role of the Kurdish Myth of Shamaran in Shaping the Story of the Queen of the Thousand and One Nights, and Tracing its root in the Myths of Ancient Elam’, Culture and Folk Literature, 10(44), pp. 1–30.
- Jung, C.G. (1988) Man and His Symbols. Milwaukee: Anchor Press.
- Kara, B. (2019) Mitoloji ve Toplumsal Cinsiyet: Şahmeran Miti. İstanbul Üniversitesi.
- Kolektif (2017) Jineolojiye Giriş. İstanbul: Aram Yayınları.
- Krippendorff, K. (2018) Content Analysis: An Introduction to Its Methodology. 4th edn. SAGE Publications.
- Liuba (2024) The Shahmaran Story: Unveiling the Myth of the Queen of Serpents -. Available at: https://knightstemplar.co/shahmaran-story/ (Accessed: 15 December 2024).
- Nicolaus, P. (2011) ‘The Serpent Symbolism in the Yezidi Religious Tradition and the Snake in Yerevan’, Iran and the Caucasus, 15(1–2), pp. 49–72. Available at: https://doi.org/10.1163/157338411X12870596615359.
- Nietzsche, F. (2021) Böyle Buyurdu Zerdüşt Herkes ve Hiç Kimse İçin Bir Kitap. Translated by R. Minareci. Can Yayınları.
- Rahbar, I. & Masrour, S. (2019) ‘Investigating and Analyzing Shāmārān’s legend of Mokriyān in Mahābād’, Culture and Folk Literature, 7(28), pp. 73–97.
- Sallmann, J.M. (2005) ‘Cadılar’, in A. Fethi (tran.) Kadınların Tarihi Cilt 3: Rönesans ve Aydınlanma Çağı Paradoksları. İstanbul: İş Bankası Kültür Yayınları, pp. 420–426.
- Soysal, E. & Yıldız, R. (2018) ‘Şahmaran’a Olan İnancımızla’, Jineoloji Dergisi.
- Stone, T.N. (2024) Enthroned Serpents: Gender-Affected Dualism of Serpent Symbol in the Myths of Zahhāk and Shāhmārān. San Francisco State University. Available at: https://doi.org/10.46569/d791sq82r.
- Tigris, A. (2022) Efsane û Destan |, xwebun2.org. Available at: https://xwebun2.org/efsane-u-destan/ (Accessed: 20 December 2024).
- Yeşilyurt, Ö. (2018) ‘İnan Çetin ve Mustafa Delioğlu’nun “Şahmaran ile Lokman Hekim’in Hikâyesi”nin Göstergebilimsel Açıdan İncelenmesi’, Akdeniz İnsani Bilimler Dergisi, 8(2), pp. 545–559.
- Yıldıran, N. (2001) ‘Yakın Doğu Sembolizminde Akrep, Yılan: Akrep-Adam ve Şahmeran’, Folklor-Edebiyat, 7(27).

## ŞAHMARAN EFSANESİNDE KADINA VE DİNE DAİR FİGÜRLER


**Özet**

Bu çalışma, Şahmaran efsanesinde kadın ve dinî figürlerin tarihsel, toplumsal ve kültürel bağlamlarını, özellikle Kürt anlatıları çerçevesinde incelemektedir. Şahmaran, Mezopotamya ve Anadolu'nun kadim tanrıça kültlerinden halk İslam'ına ve tasavvufi pratiklere uzanan bir tarihsel sürekliliğin parçası olarak Kürt halk anlatılarında özgün bir yer edinmiştir. Efsanedeki kadın figürü, doğurganlık, bilgelik ve fedakârlık gibi temaları temsil ederek toplumsal cinsiyet normlarını sorgulamakta ve bu normları dönüştürücü bir güç olarak efsanenin çok katmanlı yapısına derinlik katmaktadır. Dinî figürler ise efsanenin halk inançlarındaki kutsal yerini ve kolektif hafızadaki etkisini pekiştiren temel unsurlardır. Şahmaran, yeraltı dünyası, şifa ve bilgelik gibi motiflerle halk arasında koruyucu bir figür ve ahlaki rehber olarak konumlanmıştır. Kürt halk inanışlarında mağaralar ve su kaynakları gibi mekânlar, Şahmaran'ın kutsal mekânları olarak ritüel pratiklerin bir parçası haline gelmiştir. Çalışma, Şahmaran efsanesini tarihsel ve kültürel bağlamda ele alırken, metin analizi, tematik analiz ve mitolojik-sembolik analiz yöntemlerini bir arada kullanmıştır. Bu yöntemler, kadın ve dinî figürlerin karşılıklı etkileşimlerini disiplinler arası bir yaklaşımla incelemek için uygulanmıştır. Literatür taraması, Şahmaran efsanesinde kadın ve dinî figürleri bir arada ele alan kapsamlı bir çalışmanın eksikliğini ortaya koymaktadır. Bu çalışma, bu eksikliği gidermeyi hedeflerken, efsanenin toplumsal cinsiyet normlarını eleştiren ve halk inançlarındaki sürekliliği temsil eden çok katmanlı yapısını vurgulamaktadır. Bulgular, Şahmaran'ın toplumsal cinsiyet normlarına yönelik eleştirel bir çerçeve sunduğunu, dinî motiflerin ise halk inançları ve ritüel pratiklerdeki sürekliliği simgelediğini göstermektedir. Çalışma, efsanenin ritüel pratiklerdeki kullanımı ve farklı toplumsal bağlamlardaki dönüşüm süreçlerini anlamaya yönelik yeni teorik ve ampirik çalışmalar için bir temel sunmaktadır.



**Anahtar kelimeler:** *Efsane, Şahmaran, Mitolojik Anlatılar, Kadın Figürü, Dinî Motifler.*

**FIGURES OF WOMEN AND RELIGION IN THE LEGEND OF SHAHMARAN**


**Abstract**

This study examines the historical, social, and cultural contexts of female and religious figures in the legend of Shahmaran, with a particular focus on Kurdish narratives. As part of the historical continuity spanning from the ancient goddess cults of Mesopotamia and Anatolia to folk Islam and Sufi practices, the Shahmaran legend has held a unique place in Kurdish folk narratives. The female figure represents themes such as fertility, wisdom, and sacrifice, challenging and transforming traditional gender norms while adding depth to the multilayered structure of the legend. Religious figures, on the other hand, reinforce the sacred status of Shahmaran in popular beliefs and collective memory. Shahmaran is positioned as a protective figure and a moral guide through motifs such as the underworld, healing, and wisdom. In Kurdish folk beliefs, caves and water sources are seen as sacred spaces associated with Shahmaran, becoming integral to ritual practices. The study employs textual analysis, thematic analysis, and mythological-symbolic analysis methods to explore the interactions between female and religious figures through an interdisciplinary approach. A review of the literature reveals a significant gap, as existing studies rarely analyze these figures together in the context of Shahmaran. Addressing this gap, the study emphasizes the multilayered structure of the legend, which critiques gender norms and symbolizes continuity in folk beliefs. The findings demonstrate that the female figure provides a critical perspective on social gender norms, while religious motifs signify the persistence of folk beliefs and ritual practices. This study also highlights the ritual significance of Shahmaran and its evolving forms in different social contexts, offering a foundation for future theoretical and empirical research to better understand its rich cultural and historical dimensions.



**Keywords**: *Legend, Shahmaran, Mythological Narratives, Female Figure, Religious Motifs.*